# Ronahî

şopdara rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 598 30-Nîsan- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî


## Amadekariyên mewsima hilberînê



Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, xwediyên makîneyên çinînê ji bo pêşwazîkirina mewsima hilberînê ya îsal, dest bi sererastkirina wesayîtên xwe kirin. Xwediyên makîneyên çinînê diyar kirin ku wan ji bo rewşa hewayê dereng dest bi vê yekê kirin.

# KJK: DIVÊ JIN XWEDÎ LI KEDA XWE DERKEVIN

Bi boneya 1'ê Gulanê Cejna Karker û Kedkaran a Cîhanê Koordînasyona KJK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bal kişand ser rola jinan a di têkoşîna karkeran de. KJK'ê diyar kir ku divê jin di 1'ê Gulanê de derkevin qadan û li ser xeta Leyla Guven xwedî li keda xwe derkevin û têkoşîna xwe bidomînin.



### KEDA DAYIKAN JIYAN AVA KIRIYE

Daxuyaniya KJK'ê wiha ye: " di serî de em Cejna Karkeran 1'ê Gulanê ya hemû kedkar û karkeran pîroz dikin û em şoreşgeran silav dikin ên ku 1'ê Gulanê kirine sembola azadî, demokrasî û yekîtiya gelan. Em şehîdên sosyalîzmê yên li ser vê rêyê bi hurmet bi bîr tînin. Li cîhana ku em lê dijîn, keda dayikan jiyan ava kiriye. Heta ku keda dayikan nebe, tu awayê hebûna civakî pêk nehatiye. Pergala kapîtalîzm û şaristaniyê keda jinê xesp kiriye. Pergala kapîtalîst ji bo kara zêde faşîzm li ser cîhanê ferz kiriye."

### BILA JIN 1'Ê GULANÊ DAKEVIN QADAN

Di sala 2019'an de em bi têkoşîna jinan, azadî û demokrasiyê dikevin 1'ê Gulanê Cejna Karkeran. Jinên kedkar û karker li hemberî pergala kapîtalîst, li ser biryara avakirina sosyalîzma demokratîk in. Li Tirkiyeyê ya ku keleha pergala kapîtalîst e, jin li hemberî hemû êrîşên AKP û MHP'ê bi pêngava dîrokî ya 'Em tecrîdê bişkînin, faşîzmê hilweşînin û Kurdistanê azad bikin' li ser biryara jiyana azad ya bi rêber APO re ye. Em bang li hemû jin û kedkaran dikin ku bi biryardariya 'Mafê dayikê mafê welatê azad û demokratîk e' bila di 1'ê Gulanê de dakevin qadan.

## Bangawaziyên darizandina çeteyên DAIŞ'ê zêde dibin



***Endamên*** Meclisa Kantona Şehbayê bal kişandin ser girîngiya avakirina dadgeheke navdewletî ji bo darizandina çeteyên DAIŞ'ê û gotin: "Divê dadgeh li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê avakirin da ku çeteyên DAIŞ'ê yên girtî werin darizandin û têkoşîn li hemberî şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê were kirin."

## Girtiyên siyasî dest bi "Rojiya mirinê" dikin



***Li zindanên*** Kurdistan û Tirkiyê bi hezaran girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî bibe, di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Girtiyan bi daxuyaniyekê ragihand ku asta berxwedana grevên birçîbûnê bilind dikin û dê di 30'ê Nîsanê de dest bi rojiya mirinê bikin. Navên 15 girtiyên ku dest bi rojiya mirinê bikin, hatin eşkerekirin.

## Li Efrîna dagirkirî revandin û parçekirin

***Di ser dagirkirina*** kantona Efrînê û binpêkirinên derzagonî re bêyî ku tu alî sînorekî jê re deynin, salek derbas bû. Dagirkeriya Tirk her ku diçe kiryarên li dijî mirovahî û binpêkirina qanûnan, her wiha avakirina dîwarê parçekirinê da ku Efrînê ji Sûriyê qut bike û revandina şêniyan zêdetir dike.



## PYD: Dewleta Tirk li ser tevahiya cîhanê xetere ye

Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk di daxuyaniya nivîskî de destnîşan kir ku dewleta Tirk bû astengiyek li pêş çareseriya aloziya Sûriyê. Her wiha bal kişand ser ku bû xetereyek li ser Rojhilata Navîn bi giştî. Li aliyekî din jî teqez kir ku gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe dikare li beramber siyasetên qirêjî û krêt ên dewleta Tirk bisekinin.

## Belgeyên nû yên desteka Erdogan ji terorê re



Di civîna parlemana Hollandayê de li ser rola hikumeta AKP`ê ya Tirkiyê û desteka wê ji komên tundrew re nirxandin hate kirin û belgeyên nû ku tê de piştgiriya hikumeta serokkomarê Tirkiyê Erdogan ji komên terorîst re, di nav de El-Qaîde û DAIŞ, li Sûriye, Iraq û welatên Deryaya Spî tesbît dikin, hatin eşkerekirin.

## Li "herêmên bêçek" şer dijwar dibe



Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ragihand ku komên çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam asta êrîşên xwe li dijî hêzên rêjîmê di herêmên qaşo bêçek de yên ji çiyayên bakurê rojhilatê Laziqiyê heta bejahiya rojavayê bajarê Helebê û bejahiyên Hema û Idlibê, bilind kiriye. Her wiha hêzên rejîmê jî êrîşên xwe li dijî van herêman zêde kirin.